

Koka zimanê kurdî*

D. N. MacKenzie

Profesor V. Minorsky¹ di nivîsareka xwe de ya ko wî di sala 1938-ê de li Brukselê pêşkêşî kongreya cîhanî ya 20-ê ya rojhilatnasan kiribû hemî belgeyên dîrokî, û hinek yên zimannasî, yên berdest li dor koka gelê kurd berçav kiribûn. Wî babetî pêwendiyeka rastûrast bi vê lêkolînê ve heye, çunkî heger koka kurdan misoger bihata zanîn, vekolîna dîroka zimanê wan dê hêsantir bûya.

Di destpêkê de, pêngava herî baş ew e ko mirov hinek ji wan teoriyên ko di vî warî de ji rastiyê dûr in ji holê rake. Hinek ji wan, tevî belavbûna nivîsara profesor Minorskyî, hêj dijîn. Rehmetî Basile Nikitineyî hejmarek ji wan di beşê yekê yê lêkolîna xwe ya berfireh li ser kurdan de rêz kiribûn². Kardoxoy (*Καρδοῦχοι* bi yûnanî) ya Xenophonî hemî wextan ji bo kesên ko li babûkalên kurdan digerin³ bijartina herî rehet bûye. Lê em dibînin ko hinek kesan hewil daye kurdan bi xaldiya urartuyan, sagartuyan, yan zikirtuyan, û herweha gutiyan ve girê bidin li ser bingehê ko wan peyvyan wekhevîyeka dengî, çi zêde çi kêr, li gel navê îro yê vî gelî heye. Xaldî, xweşbextane, ji meydanê hatiye derxistin çunkî ew, wek têt zanîn, navê xudêyekî ne yê miletekî ye⁴. Hemî girêdanên dî ji aliyê naveroka xwe ve ne mimkin in.

Diyar e ko derbasbûna navên *Κυρτιοι* (kurtyoy) yan Cyrtii⁵ (kurtî) di nivîsên Polybios, Livius û Strabonî de bi rastî amajeya eşkere ya yekane ye bo kurdan di berhemên nivîskarên kevin yên berî me de. Herdu nivîskarên yekê behsa wan wek qolên rimhavêj di leşkerên Med û Asyaya Biçûkê de dikin. Lê Strabon wan eşkere bi çiyayiyên kûvî yên ko li Med û Ermenistanê, lê herweha li Parsê, dijîn, bi nav dike. Ji bilî vê îdîaya daawiyê, hemî belgeyên pozîtîv nîşan didin ko kurd gelekê medî ye. Profesor Minorsky vê dîtîne bi germî hembêz dike.

Heger em bihên serdema ereban, em dê bibînin ko navê *kurd* ramaneka nû ya heqaretbûnê wergirtiye û di pratîkê de bûye hevmaneya "koçer"-ê. Bo nimûne, profesor Minorsky gotinên erdnasê sedsala nehê Ibn Rustayî vediguhêze dema ew wesfa lombardan dike û dibêje ko ew "wek kurdan, li deştê di kûnan de dijîn"⁶. Ev nav îro bi geşbûna hesta neteweyî ya kurdî ji bo hema

* Sernivîsa orijînal ya vê nivîsarê "The origins of Kurdish" e. Ew di sala 1961-ê de di *Transactions of the Philological Society* de belav bûye. [Wergêr]

Kurtkirinên ko di wergera vê nivîsarê de hatine bi kar anîn: *b.n.* "bo nimûne", *bnr.* "binêre", *hb.* "hember bike", *hs.* "heman serkanî (çavkanî)", *n.* "not", *rûp.* "rûpel". [Wergêr]

Wergêr spasiya Arif Zêrevanî ji bo rastkirin û têbînîyên wî li ser reşnivîsa vê wergerê dike.

¹ "Les origines des Kurdes", *Actes du XX* Congrès International des Orientalistes*, Louvain, 1940, 143

² *Les Kurdes, étude sociologique et historique*, Paris, 1956, 2-16.

³ Bnr. bo nimûne, li G. R. Driver, "The Name Kurd and its Philological connexions", *JRAS*, 1923, 393, û berhemê vê dawiyê I. M. Oranskij, *Vredanie v iranskuju filologiju*, Moskva, 1960, 316.

⁴ Bnr. A. Goetze, *Kleinarien*, Munich, 1957, 191, n. 6.

⁵ Bnr. Driver, "The Name Kurd", 397.

⁶ *Bibliotheca geographorum Arabicorum*, Tome, VII, 128.

bigire hemî gel û eşîrên ko di navbera tirk û ereban li rojavayî û farisên xwerû li rojhilatî de hene têt bi kar anîn. Ev, di nav gelên îranî de, ji bo lor û eşîrên goranî yên cida jî derbaz dibe. Dîtina kurdên vê serdemê jî li ser dîrokê ji xwe sade ye. Çunkî ew hest dikin ko pêwîstiya wan bi babûkalên lehengî heye û dibînin, wek bibêjî, kes li medyên desthilatdar xwedî derneketiye, vêca bê dudilî xwe bi wan ve girê didin. Bi cidî, niho li nik wan bûye adet ko hejmar 612-ê, sala ko mediyên Nînewa dagîr kirî, li ser tarîxa me zêde bikin û bi navê tarîxa medî bi kar bînin.

Di vê tevlihevîna faktayên kêr û texmînên pir de, belgeyên zimannasî roleka giring dilîzin. Lê, ev war jî qet ne zelal e, çunkî profesore navdar N. J. Marrî carekê ji caran hêvî dikir şopepeyvên "kurdiyeka kevna" di kurdiya nûjen de bibîne da bibe beşek ji grûpa kertî yan gorcî ya tayê zimanên yafîtî.⁷ Gotina pêdvî di heqê teoriyên weha de ew e ko ew ji bo piştgiriya xwe hêj li benda wan faktayan in yên ko dê bi borîna wextî eşkere bibûna. Halê hazir, em dikarin bi rehetî bibêjin ko kurdî zimanekê îranî yê normal e. Erkê min yê pêşîn ew e ko divêt ez kurdiyê bi rêya destnîşankirina sîmanyên ko wê ji devokên dî yên îranî cida dike bidim nas kirin. Mixabin! Divêt ez her ji destpêkê li xwe mukir bihêm ko encamên min bi giştî negatîv in, çunkî hema bibêje her sîmayeka kurdiyê hembereka xwe di devokê yan pirtir yên îranî de heye.

Berbiçavtirîn sîma guhorîna [m]-ya pêşvokal bo [v]-yê, paşî di hinek devokan de bo [w]-yê ye; b.n.:

kurdî ⁸	<i>nav/w</i>	<	avestayî	<i>namen-</i>
	<i>hav/wîn</i>	<		<i>hamine</i>
	<i>dû(v)</i>	<		<i>dume</i>
	<i>kev/wan</i>	:	farisî	<i>keman</i>

Hinek nimûneyên vê guhorînê, wek ko Paul Tedescoyî di nivîsara xwe de "Dialektologie der Westiranischen Turfantexte"⁹ de diyar kiribû, di parsiya manî de jî hene. Guhorîneka wek vê carcarkî di belocî û loriyê de û sîstematîk di vefsiyê¹⁰ de jî xuya dibe. Lê ev nabe belge ko ew sîma sîmayeka hevbeş ya malbatî ye di van hemî devokan de. Ev di hejmareka berbiçav ya peyvên ji erebiyê nûdeynkirî de di kurdî û vefsiyê de têt dîtin, b.n.

kurdî	<i>hev/wîr,</i>	vefsî	<i>hewîr</i>	erebî	<i>xemîr</i>
	<i>civat</i>				<i>cema'et</i>
	<i>tewaw</i>				<i>temam</i>
	<i>(şem)</i>		<i>şewe</i>		<i>şeme'</i>

Ev sîma bi tenê di devoka belociya jorî de¹¹, ya ko ji hemî devokên dî yên belociyê pêşveçûyîtir e, heye û bi [m]-ya navvokal ve girêdayî ye. Zêdebarî vê jî, vokala berî wê ginginî ye.

⁷ Veguhastina Nikitineyî ye, *Kurdes*, 4.

⁸ Hemî nimûneyên kurdiyê ji notên min in.

⁹ *Monde Orientale*, XV, 208.

¹⁰ Devokê e ji rojhilatê Hemedanê; bnr. M. Mughaddam, "Gûyûşhayî vefs ve aştiyan ve tefrîş", *Îran Kûda* 11, Tehran, 1949.

¹¹ Nimûne ji W. Geiger, *Etymologie des Balūcī*, Munich, 1890.

belociya jorî	<i>haveg</i> : belociya jêrî	<i>bameg</i> "zevî",	farisî <i>zam</i>
	<i>nyava</i> :	<i>nyama</i> "nîva"	<i>miyane</i>
	<i>nevaş</i> :	<i>nemaş</i> "nivêj"	<i>nemaz</i>

Kurdî di guhorîna grûpên dangan [şm] û [zm]-an bo [v] yan [w], li gor devokan, bêhempa ye. Tesaduf, ev diyar dike ko guhorîna [m] bo [v/w]-yê paştir çê bûye, çunkî ketina konsonanta yekê ya van grûpan gelek belav e, b.n.

çeşma farisî, ya ko bi kurdî *çav/w* e, di belocî, goranî¹² û vefsiyê de *çem* e, di gîlekiyê¹³ de *çum* e û di ormurriyê¹⁴ de *cimî* ye.

tuzma farisî, ko bi kurdî *tov/w* e, di belocî û goraniyê de *tom* e û di peştoyê de *toma* (di maneya "hevîr" de) ye.

şuzma farisî, ko bi kurdî *şov, şow, şêf* e, di belocî û goraniyê¹⁵ de *şom* e û di vefsiyê de *şûm* e.

Hebûna [k]-ya destpêkê hember [x]-ya îranî, [kh]-ya sanskrîtî, bi dîtina serpê, wek sîmayeka xwerû kurdî xuya dike, b.n.

kurdî <i>ker</i> (guhdirêj)	:	farisî <i>xer</i> ,	avestayî <i>xere-</i>
<i>kenîn</i>	:	<i>xendîden</i> ,	îranî √ <i>xend</i>
<i>kanî</i>	:	vefsî <i>xanya</i>	avestayî <i>xen-</i>

Rast e ko formên weha di devokên rojhilatî jî de tînin dîtîn, b.n.¹⁶

belociya jêrî <i>ker</i> ,	paraçî <i>khör</i>	"ker (guhdirêj)"
<i>kendeg</i>	<i>khen-</i> ,	wexî <i>kand-</i> "kenîn",

lê ev guhorîn di van devokan de li gel guhorîneka wek vê ya frikatîvên destpêkê yê dî, [f], [θ], ya ko şopên wan di kurdiyê de nînin pêk tînin. Lêkera kurdî, *kirrîn* (farisî *xerîden*), ya ko bi temamî ji **xrî-* ya îranî, *krî-* ya sanskrîtî û **q^hrei* ya hindo-ewropî hatiye, hemî hîviyên ko kurdiyê bi awayekî **kh*-ya pêşîranî parastiye pûç dike. Ev xuya dike ko [k]-ya destpêkê di hemî nimûneyên kurdî de jî frikatîva îranî hatiye.

Parastina şeweyekê kevnar yê riha *çyu-* "ç-" (ji lêkera –çûn-ê) sîmayek e ko kurdiyê ji giştî cîranên wê yê nêzîk cida dike. Mirov dikare piştrast bibêje ko [ç] di qurmên ko jî vê rihê ava bûne de di hemî devokên kurdî de heye, lê ew di devokên îranî yê rojavayî yê dî de jî mêt e bûye [ş]. Şeweyê kevintir di devokên îranî yê rojhilatî de zindî ye wek ko formên li jêrê diyar dikin.

peşto *j-*,¹⁷ wexî *ç'aw-*,¹⁸ paraçî *çh-*,¹⁹ ormurri *caw-*,²⁰ osetî *caaw-*.

Bi kurtî, ez ji bilî vê [ç]-yê û guhorîna [şm] û [zm]-an hîç sîmayeka dî ko di nav hemî devokên kurdî de belav e û li derveyî wan nahêt dîtîn nabînim. Diyar e

¹² Nimûneyên goranî bi piranî ji notên min in li ser devoka hewramanî (ya Hewramanî Lahon) ya ko gelek kevnar e. Nimûneyên dî ji materyalê O. Mannî ne, *Mundarten der Gûrân, ... bearbeitet von Karl Hadank*, Berlin, 1930.

¹³ A. Christensen, *Contributions à la dialectologie iranienne*, Copenhagen, 1930, 288.

¹⁴ G. Morgenstierne, *IIFL*, I, 390.

¹⁵ Bnr. nivîsara min "Bâjalânî", *BSOAS*, XVIII, 435.

¹⁶ *IIFL*, I, 37; II, 457.

¹⁷ Morgenstierne, *EVP*, 77; *AO*, I, 268.

¹⁸ *IIFL*, II, 519.

¹⁹ *IIFL*, I, 244.

²⁰ hs., 391.

ji bo veqetandina bêdudilî ya kurdiyê ji devokên dî yên îranî, pêwîst e ko ew hema hîç nebe li gel her devokeka îranî ya rojavayî bihêt hember kirin û sîmayên wan yên wekhev û jêkcida bihên rêz kirin. Divê, ji bona hoyên pratîkî, kurdî, ya ko ji aliyê îranînasan ve bi giştî bi "kurdî" hatiye nav kirin, li gel cîranên wê yên kevin û nû yên herî nêzîk bihêt hember kirin.

Ev cidakirina dawiyê hat kirin da amaje bi wê nivîsara Tedescoyî bêt kirin ya ko wî tê de ²¹ diyar kiriye ko belocî, herçend ko îro serekî li xilasiya başûr-rojhilatê de vera îranî têt peyvîn, di esl de zimanekê îranî yê bakur-rojavayî bû û cîraneka nêzîk ya kurdiyê bû. Tedescoyî gelek sîmayên hevbeş di nava wan de rêz kirine. Lê, yek sîmaya serekî ko têra veqetandina belociyê ji hemî zimanên dî yên îranî yên rojavayî û kurdiyê dike parastina temam ya konsonantên navvokalî di belociyê de hemberî dereceyên cida yên guhorînê li cihên dî ye. Hember bike!

-p-	belociya jêrî <i>ap</i>	:	kurdî <i>av/aw</i>	:	goranî <i>awî</i>
-t-	<i>dîte</i>	:	<i>dî</i>	:	<i>dî</i>
-ç-	<i>roç</i>	:	<i>roj</i>	:	<i>ro</i>
-k-	<i>zemîk</i> "deramet"	:	<i>zev/wî</i>	:	
-d-	<i>wad</i>	:	<i>xwê</i>	:	
-c-	<i>drêc</i>	:	<i>dirêj</i>	:	
-g-	<i>rogen</i>	:	<i>ron</i>	:	<i>rûen</i>

Devokên lorî, û ji wan bextiyarî ²², di warê zimannasiyê de îro cîranên kurdiyê yên herî nêzîk in ji aliyê başûrî ve. Ev zêde wek farisiya nû ne û lewre divê bi hev re bihên mamele kirin. Ew bi hejmareka guhorînên dengsazî, ko farisîbûna wan baş têt zanîn, ji kurdî, belocî û devokên dî yên îranî yên bakurî têt cida kirin. Mirov dikare [d]-ya farisî hember [z]-ya îranî dane, b.n.

farisî <i>danisten</i>	:	kurdî <i>zanîn</i>	bextiyarî <i>danisten</i>	belocî <i>zaneg</i>
<i>damad</i>	:	<i>zav/wa</i>	<i>dûma, dowa</i>	goranî <i>zema</i>

Paşî [h]-ya farisî heye ya ko ji [θ] (yan [s]) û [ð]-ên kevin hatiye û li hember wê di kurdî û yên dî dibe [s] yan [z] ye; b.n.

farisî, bextiyarî <i>ahen</i>	:	kurdî, belocî <i>asin</i>
farisî <i>ahû</i> , bextiyarî <i>ahî</i>	:	kurdî, belocî <i>as(i)k</i>
farisî, bextiyarî <i>mahî</i>	:	kurdî <i>masî</i> , goranî <i>mas[awî]</i>
farisî <i>xwah-</i> , bextiyarî <i>xo-</i>	:	kurdî <i>xwaz-</i> , goranî <i>waz-</i>

Li dawiyê, [z]-yê farisî ji [c]-ya kevin, ya ko di belociyê de hatiye parastin û di kurdiyê de bûye [j], hatiye; b.n.

farisî <i>zen</i> , bextiyarî <i>zêne</i>	:	kurdî <i>jîn</i> , belocî <i>cen</i>
farisî <i>zîsten</i>	:	kurdî <i>jîn</i>
farisî <i>zih</i>	:	kurdî <i>jê</i> , belocî <i>cig</i>

Cîranên kurdiyê yên dawîn yên ko divêt bihên behs kirin devokên herî nêzî wê ne. Bi rastî, gotina "cîran" ne gotina herî di cih de ye çunkî devokên goranî

²¹ "Dialektologie, " 252-3.

²² Nimûneyên bextiyarî ji D. R. Lorinser, *Phonology of the Bakhtiari ... Dialect ...*, London, 1922, 102-106 hatine wergeritin..

yên ko em dê behsa wan bikin niho kin bûne û bûne giravên axiftinê yê biçûk di nav deryayeka kurdiyê de. Di cihên ko goranî tê de taybetmendiye bakurî nîşan dide, kurdî piranî caran bi devokên farisî re ye. Yek ji van haletan, guhorîna [y]-ya destpêkê bo [c]-yê di farisî, kurdî, û belociyê de ye ya ko di goraniyê de hatiye parastin nimûneyek e ji wan haletan; b.n.

goranî *yeve* : farisî *ceu* : kurdî *co* < avestayî *yeve-*
yeker : farisî *ciger* : kurdî *cerg* < avestayî *yaker-*

Dibe ko ev herdu peyvên kurdî ji farisiyê hatibin deyn kirin, lê ev yek ji bo peyva kurdî *car-ê*, ya ko dikeve hember *car-a* farisiya navîn û *yavena* ya parsî, qet derbaz nabe.²³

Goranî di guhorîna [hw]-ya destpêkê ya eslî bo [w]-yê de wek belociyê ye, lê encam di kurdî û farisiyê de [xw] ye; b.n.

goranî, belocî *wan-* : farisî *x^wan-*, kurdî *xwên-* < \sqrt{hwan}

goranî, belocî *wer-* : farisî *x^wur-*, kurdî *xo-* < \sqrt{hwer}

goranî *wê*, belocî *wet-* : farisî *x^wud-*, kurdî *xo-* < $\sqrt{avestayî x^weto}$

Di vê navê de, hêja ye bêgortin ko di vî halî de kurdî taybetmendiye, ew jî guhorîna [hw] bo [f]-yê ye²⁴, ya ko ji bo mediyê têt hesab kirin nîşan nade.

Ev hevalbendiya netemam ya kurdiyê li gel herdu terefan hizrekê li ser wargehê eslî yê devokên kurdî – yan jî yê eslî wan yê hevbeş – li gel devokên îranî yê rojavayî yê di peyda dike, lê ev babet pêdvî lêkonlînên zêdetir e. Tedescoyî²⁵ behsa wan kiriye tevî ko ew mijûlî devokên bakur-rojavayî yê tekstên tofanî, anku parsiya manî, bû û wî ew wek devokeka yekgirtî lê ji parçeyên hevgirtî diyar kiribû²⁶. Niho mimkin e mirov dîtînen Tedescoyî piçek serast bike bêyî ko encamên wî bihên guhortin. Wî cedwelek ji bo Hauptbeispielea xwe [nûnerên serekî] ko pîvanên wî bûn ji bo grûpkirina devokan çê kiribû. Min ew cedwel kiriye diyagram. Bêguman, aliyê wê yê rastê, bi taybetî yê girêdayî navên "Caspian" (xezerî) û "Central" (navendî), gelek hatiye hêsan kirin; lê, bi dîtina min, aliyê çepê, ko kurdî tê de ciyê xwe di navbera proto-belocî û farisiyê de dike, rewşê qenc dinimîne.

Xêzên cidaker yê eleqedar ev in:

(1) ya ko devokên ko qurmê dema niho ya bi dengê difinî ji lêkera "kirin"-ê, *kun-* hwd. parastiye ji devokên ko qurmê ji riha *ker-* heye cida dike,

(2) ya ko devokên xwedî formên partisîp yê ko ji **a-gete* ne ji wan yê ko ji **a-gmete* yê çê bûne cida dike, (Heger em bikarin ji navê paytextê mediyên biryar bidin, kurdî li vê derê jî ji mediyê vediqete. Eynî ev *-gmete* di navê paytextê mediyên de bi yûnanî *Αγβατανα* (açbetana) û *Εκβατανα* (ekbatana) û bi farisiya kevin *He(n)gmetane-* ê de heye, bes di kurdiyê de nahêt dîtînen.)

(3) ya ko devokên xwedî terkîba îzafeyê, ya ko ji cînavê girêkî yê kevin çê bûye, ji devokên bêyî terkîba îzafeyê cida dike; û li dawiyê


²³ Tedesco, "Dialectologie," 193.

²⁴ E. Benveniste, "Persica II", *BSL*, 31, 73.

²⁵ "Dialectologie," 253-4.

²⁶ hs, 246.

(4) ya ko devokên ko [dw]-ya eslî ya destpêkê kiriye [d] ji wan yên ko ew deng kiriye [b] cida dike û devokên ko [y-]-ya kevnar kiriye [c-] ji wan yên ko ew deng parastiye cida dike. Bi tenê peyvek heye ko van dengguhortinan diyar dike, ew jî *şîr* yan *şift* e.



Bi awayekê siruştî, diyagrama han bi tenê îmkanekê nîşan dide û wê hîç giringiya cografîk nîne. Tertîbkirina devokên behskirî bi her awayekê dî, li gel parastina heman xêzan, dê rewşê aloztir bike.

Kêm ji wan sîmayên mayî yên ko Tedescoyî behsa wan kiriye alîkariya me dikin ko em cihên kurdî, belocî û fârisiyê diyar bikin. Bo nimûne, guhorîna [w]-ya destpêkê bo [b]-yê, ya ko di fârisî û hindek devokên kurdî de rû daye, guhorîneka nû ye çunkî ew bi taybetî di wan devokên kurdî yên jêrî de yên ko gelek nêzîkî fârisiyê ne xuya nabe. Profesor K. Barr²⁷ bi hizra min rast dibêje ko ev cidahî di devokên kurdî de vedigere tesîra goraniyê li ser devokên jêrî. Ev [w] di piraniya devokên dî yên îranî yên rojavayî de hindik hatiye guhortin, lê ew di belociyê de bûye [g(w)]; b.n.

fârisî, bextiyarî	<i>bad</i>	: goranî, kurdiya jêrî	<i>wa</i>	: belocî	<i>gwat</i>
kurdiya jorî/navendî	<i>ba</i>	semnanî ²⁸ , zehrayî ²⁹	<i>va</i>		

fârisî, kurdiya jorî/ navendî	<i>baran</i>	: goranî, kurdiya jêrî	<i>waran</i>	: belocî	<i>gwarîş</i>
		zehrayî	<i>varan</i>		
		semnanî	<i>varîş</i>		

kurdiya jorî/navendî	<i>bîr</i>	: goranî, kurdiya jêrî	<i>wîr</i>	: belocî	<i>gîr</i>
----------------------	------------	------------------------	------------	----------	------------

(fârisî), bextiyarî	<i>bêz-</i>	: goranî	<i>wêç-</i>	: belocî	<i>gêç-</i>
kurdiya jorî/navendî	<i>bêj-</i>	kurdiya jêrî	<i>*wîj-</i>		

Dîsan xuya dibe ko kurdî û fârisî di guhorîna [θr]-ya îranî ya kevin bo [s]-yê de wekhev in. Tedescoyî bi tenê yek nimûne³⁰, ko hejmara "3" yê ye, bi kurdî *sê*, bi dudiliyeka qebûlbar dabû. Lê mirov dikare peyveka dî jî, ya ko bi ihtîmaleka mezin ne deynkirî ye ji ber ko nasa wê ya şopbar ya herî nêzîk bi tenê di devoka başkerdî ya Makranê de heye, lê zêde bike. Ew peyva kurdî *pê-xwas*, yan *-xawus*, e ko di başkerdiyê de *pa-xwewes* e. Li milê dî, peyva *pa-wirwa* di goraniyê de heye û mirov di zehrayiyê de *pa-xarowa* û *-xaropa*-yan dibîne. Ev hemî form, wek ko Dr. I. Gershevitchî, yê ko peyva başkerdî dîtîbû, bi camêrî ji min re diyar kirî, vedigerin peyva avestayî *x^wa.aoθra-* ko wateya wê "kewşa xwe li pê xwe kirin" e. Vêca,

avestayî *x^wa.aoθra-* > **xwause-* > *xwas* [di kurdiyê de]
 > **(x)wau(h)re-* > **wawir* > *wirwa* [di goraniyê de]
 (hb. goranî *yerê* "3" < **hrê* < **θreyeh-*,
 û dengguhorkanê di kurdiya navendî de
birrwa < *bawir*)

²⁷ *Iranische Dialektaufzeichnungen, aus dem Nachlass von F.C. Andreas*, Berlin, 1939, 144.

²⁸ Christensen, *Contributions II*, Copenhagen, 179-87.

²⁹ Zehra deverka başûrê Qezwînê, nêzîkî Takistanê, ye. (v. Henning, *TPS*, 1954, 159). Devokên zehrayî yên du navendan, Bermowa (Îbrahîmabad) û Sezciwa (Segzabad) ji aliyê Celal Al Ehmedî ve di *Tat-nîþîna-yi bulûk-i Zehra*, Tehran, 1958 de hatine şirove kirin.

³⁰ "Dialektologie," 199, n. 1.

> **x(w)au(h)re-* > **xaru-* (+*pa*) [di zehrayiyê de]
 (hb. zehrayî *xos-* "xew" < *x^wefse-*)

Ji bîr neke ko [s]-ya ko ji [θr]-yê çê bûye di belociyê de jî heye; b.n.

puseg "kur" < **puθre-ke-*, *as* "agir" < **aθr-*

Bi kurtî, em dikarin sîmayeka dî li xêza cidaker ya çarê zêde bikin.

Encamên guhorîna [rd] û [rz] di devokên nefarisî yên cida de yekcar nezelal in çunkî peyv ji hemî aliyan ve hatine deyn kirin. Şik tê de nîne ko guhorîna [rd] bo [l] yan [r] di gelek devokan de rû daye; b.n.

semnanî *vel(e)*, goranî *wilî* "gul" > **werde-*
 goranî (kendulayî) *zil* "dil" > **zrd-*

Lê pêşpirtika lêkerî *hur* jî, ya ji *iridue*-ya avestayî hatiye û hember *ul-*a farisiya navîn e, di goraniyê de heye. Hembera wê di kurdiya jorî de *hil* û di ya navendî de *hel* e û bi eynî wê fonema [l]-yê e ya ko em di lêkera *palawtin*, *palêw-* de dibînin. Heger em wê ji vê formê **pere-daveye-*, ya ko *palay-* ya farisî jî dide ³¹, darêjin, em dê bibînin ko formeka me ya xwerû kurdî bi [w] li şûna [y]-yê, wek parsiyê ³², heye. Lêkereka kurdiya jorî bi heman wateyê heye, ew jî *parzinîn* e ya ko di goraniyê wek *çay-parzên* "sefînkaya çayê" têt dîtin û paşî wek *perzel* "filter, sefandin" ketiye di nav zimanê ermenî de. Bêşik, herdu lêker dikarin di kurdiyê de bijîn, lê parastina [rz]-yê tiştekê balkêş e. Tedescoyî ³³ diyar kiriye ko ev grûp di hindek devokan de bûye [l] bêyî ko di qonaxa [rd]-yê de derbaz bibe. Herçend ev dîtin bo cara yekê biguman têt ber çavan, lê dibe ko ev rewşa kurdiyê be, çunkî di dema ko [z] di peyvên wek *zanîn* û *zava* de ³⁴ hatiye parastin, hejmareka pirtir ji peyvên bi [l]-yê (kurdiya jorî) yan [ll]-yê (kurdiya jêrî) ko hemberî [rz]-ya kevnar lê ne parastina wê grûpê ne di kurdiyê de heye. B.n.,

kurdî	<i>bil/lind</i> ³⁵	:	avestayî	<i>birizent-</i>
	<i>hêştin, hêl/l-</i>	:		√ <i>hrz</i>
	<i>mil</i>	:		<i>mirizu-</i>
	<i>mal/lîn</i> ³⁶ , <i>mal/l-</i>	:		√ <i>mrz</i>
kurdiya navendî	<i>sipil</i>	:		<i>spirizen-</i>
kurdiya jorî	<i>balgî, balîf</i>	:		<i>beriziş-</i> , farisî <i>balîş</i>
	<i>gilî</i>	:		√ <i>grz</i> , farisî <i>gile</i>
lê,				
kurdî	<i>berz</i>	<	avestayî	<i>beriz-</i>
	<i>herzin</i>	<		* <i>h(e)rzene-</i> , farisî <i>erzen</i>
û belkî				
kurdiya jorî	<i>gazin(de)</i>	<	√ <i>grz</i>	

³¹ W. B. Henning, "Das Verbum des Mittelperischen der Turfanfragmente", *ZII*, 9, 209.

³² Tedesco, "Dialektologie," 197

³³ hs., 206.

³⁴ Bnr. rûp. 4 li jorê

³⁵ Kurdiya navendî herweha *bala* "bejin" jî heye lê bi tenê di *bejn-û-bala* û *bala-berz* "bejinbilind"-an de.

³⁶ Radera *maltin* yan *maştin* di hinek devokan de

Goraniyê bi tenê *berz* di maneya "bilind" de heye, lê wê (kendulayiyê) herweha *bala* "jor" jî heye. Wê *mil* û *mal-* "malîn" wek kurdiyê hene, lê herweha *mazî* "stûna piştê" jî ko ji **merz-* hatiye heye. Ez bawer nakim mimkin be ko mirov piştrast bibêje ka bi rastî kîjan guhorîn ya kurdiyê ye, lê mişeyiya peyvên bi [l] yan [ll]-yê, çi resen bin çi deynkirî bin, giring e.

Wisa diyar e ko belociyê [rd] û [rz] jî parastine, lê delîl kê m in. Yek gotina şîrî, *zirdê* di wateya "dil" de, ko tê de [rd] peyda dibe heye. [rz] di peyva *berz* "bilind" û herweha *berzî* "barzîn" ³⁷ de têt dîtin. Ji van peyvan û ji peyvên *dil* "dil", *gul* "gul" û *palay-* "sefîn-" ko ji farisiyê hatine deyn kirin derkeve, bi tenê peyvên aloz *balad* "bilindî", ko ji **berzad-* ya îranî ye, û lêkera *ileg, ište* "hiştin", ko ji \sqrt{hrz} hatiye, têt dîtin. Cidahiya di navbera kurdî û belociyê de di vî warî de têt wê maneyê ko proto-kurdiyê têtîliyên nêzîktir li gel farisiya li başûrî hebûn.

Em ji Tedescoyî dûr dikevin û dibêjin ko eynî boçûna li jorê ji bo hejmareka peyvên ko di esil de xwedî [nd] ne derbaz dibe. Me berê jî peyva *kenîn* < \sqrt{xend} dîtîbû û em dikarin *genîn* "genî bûn" < \sqrt{gend} ya kurdiya navendî, *benî* ³⁸ < $\sqrt{bendeke-}$ ya kurdiya jorî û belkî *hinartin, hinêr-* a kurdiya jorî, ko di kurdiya navendî de (*he*)*nardin, nêr-* e û ez li hember ya farisiya manî ya navîn *hen(n)ar-* di maneya "çav zil kirin" ê de < *han* + \sqrt{der} ³⁹ dadinim, lê zêde bikin. Weha, kurdî, wek farisiya manî ya navîn, [nd] kurt dike û dike [n] .

Wekheviya dawiyê di navbera kurdî û farisiyê de di parastina [fr]-ya detpêkê de ye ya ko di gelek devokên îranî yên bakur-rojavayî de bûye [hr] û dengên wek wan û di belociyê de bûye [ş]; b.n.

farisî *furûş-* : goranî *wureş-* : belocî *şeweşk-* < **fre-vexş-*
kurdî *firoş-* vefsî *rûş-*

kurdî *firman* : goranî *hermane* "kar" (hb. kurdî *ferman*)

Li ber rohniya nêzîkbûna kurdiyê ber bi farisiyê ve, bi min giring e ko qet ne be mirov gotinên profesor Minorskyî binirxîne dema ew dibêje ko "kurdî, bi naveroka xwe, ... bê şik zimanek e ji grûpa bakur-rojavayî ya zimanên îranî" ⁴⁰ û herweha tekeza wî ko "divê kurdî li ser bingehe mediyê bihêt zelal kirin". ⁴¹

* * *

Mijara me heta niho serekî li ser dengsaziya kurdiyê, wek zimanekê yekgirtî, bû. Ev yekgirtin di warê peyvsaziya de ne mimkin e. Min newekheviyên di navbera devokên kurdiya jorî û navendî yên cida de li cihên dî

³⁷ Morgenstiene, "Notes on Balochi Etymology", *NTS*, *V*, 41.

³⁸ Di frasa "ez benî"-yê de

³⁹ Henning, "Verbum," 193.

⁴⁰ "Origins des Kurdes," 145.

⁴¹ *hs.*, 152.

şirove kirine.⁴² Zanyariyên me di heqê devokên kurdiya jêrî de hêj ne tamam in, lê ew zanyarî dikarin nîşan bidin ko ew devok bi qeder cidahiya wan ji kurdiya jorî ji hev cida ne. Lewra, ez dê di lêkolîna li pey egerên jêkcidabûna devokên kurdî de xwe piraniya caran bispêrim devokên jorî û yên navendî.

Devoka jorî xuya dike ko ew bi çend awayan ji ya dî kevintir e. Ew di warê dengsaziyê de tenê bi parastina fonemên [v] û [w]-yan, ko hember [w]-ya devokên dî ne, kevnatiya xwe nîşan dide. Bo nimûne,

kurdiya jorî	<i>civîn</i>	:	kurdiya navendî	<i>cinêw, cön</i>	< <i>duşnam</i>
	<i>nivistin</i>	:		<i>nûstin</i>	< <i>ni + √ped</i>
	<i>şev</i>	:		<i>şew</i>	< <i>xşep-</i>

lê,

kurdiya jorî *bawer(î)* : kurdiya navendî *bawir, birrwa* < *waver*

kurdiya jorî û navendî *mewîj, mêwîj* < **medwîçe-*

Di heman wextî de, kurdiya jorî di wergirtina fonemên biyanî de, ji wan dengên qelew [s], [t] û [z]⁴³ yên zimanên samî, dengên nehewadar [p], [t], [k] (yên ermenî !) û herweha [ç]-yeka dakişandî yên ko di zarên dî de peyda nabin, ji devokên dî merdtir bûye.

Li milê dî, kurdiya jorî di warê peyvsaziyê de xwe gelek li ber guhortinan ragirtiye, lê herweha hinek terkîbên xweyî, ko mirov texmîn dike alternatîvên wan yên eslî hene, avêtine. Bo nimûne, wê li dema ko sîstemeka tamam ya tewanga navdar û cînavan parastiye, dev bi yekcarî ji paşpirtikên cînavî berdaye. Di devokên dî de, tewang têk çûye, lê paşpirtikên cînavî hêj gelek karan ji karên xwe dikin. Binêre,

kurdiya jorî	<i>wê jinê nan pat</i>	:	kurdiya navendî	<i>ew jine nan-î kird</i>
	<i>nanî bide min</i>	:		<i>nan-im biderê</i>

Dîsa, demên borî yên lêkerên têper di kurdiya jorî de ramana xwe ya pasîviyê di sadetirîn formê de diparêzin; b.n.

kurdiya jorî *ez derman kirim*

Terkîba han kêman caran ji wê ya ko di farisiya kevin de têt dîtin dût dikeve

ime tye mene krtem

hb. kurdiya jorî *eve-ye yê min kir*

(Devokên navendî çi qas ji vê formê dût ketine dê li jêrê bihêt dîtin).

Hîç forma lêkerî ya dî ji bo derbirîna pasîviyê di demên niho de di kurdiya jorî de, wek ya ko di devokên dî yên kurdî de peyda bûne, diyar nebûye. Terkîbeka sade li şûna wê têt bi kar anîn; b.n.

kurdiya jorî *dê hête kuştin*

Heger em bala xwe bidin kurdiya navendî, em dê hejmareka guhortinên peyvsazî bibînin. Hinek ji wan teqrîben nû çê bûne. Yek ji wan, berfirehkirina

⁴² *Kurdish Dialect Studies I*, London, Oriental Series, 1961.

⁴³ *h* û ' di kurdiya jorî û navendî de hene.

terkîba "boriya têper" bi zêdekirina paşpirtika kesî, ko wezîfeya objektê nedîrek dike, bi ser lêkerê ve ye, b.n.

kurdiya navendî *xew-im dîw-e* "min xewnek dîtiye"
lê *xew-im pêwe dîw-ît* "min xewnek bi te ve dîtiye"

Heman guhorîn di devoka hewramî ya goraniyê de, ya ko min qeyd kiriye, têt dîtin.

hewramî *kitêbeke-m da-nî pene* "min pirtûk daye te"
lê ji ber ko hîç nimûne di materyalê hewramî yê Benedictsênî⁴⁴ de nahên dîtin, ev sîma nabe sîmayeka hevbeş ne di devokên hewramî ne jî di goraniyê de. Divêt mirov ji bo ravekirina gelek sîmanyên dî yên kurdiya navendî ji goraniyê pê ve dûrtir neçe.

Li pêşiyê, veqetandeka binavkirinê *-eke* di hewramî, devokên dî yên goranî yên serekî û herweha di zazakiyê⁴⁵ de jî heye. Bikaranîna vê paşpirtikê bi tenê di devokên kurdî yên navendî û jêrî de heye. Di kurdiya jorî de, rêya binavkirina navdêrê bi tenê bi bikaranîna rengdêrên îşarkî têt kirin. Zanyariyên li ser veqetandeka dî, *-a* yê, ya ko di hejmareka berbiçav ya devokên îranî yên rojavayî de belav e ne gelek balkêş in. Ya balkêştir ew e ko ev veqetandek bi yekcarî di kurdiya jorî de nîne.

Me berê jî dît⁴⁶ ko terkîba îzafeyê hem di kurdî û devokên ko me jê re "devokên îranî yên navendî", ji wan goranî, gotiye de û hem di farisiyê de heye. Wekhevî ji wê derê pê ve xelas dibe. Awayekê îzafeyê yê devokên kurdiya jorî yên kevin heye ko heta niho maye û wek cînavê girêkî têt bi kar anîn. Îzafe, wek hemî cînavên dî di van devokan de, zayenda xwe ji navdêra pêşî xwe werdigire; b.n.

kurdiya jorî *bab-ê min*
dî-a min/dayk-a min
ew kes-ê ewwilî bêt
ew mesela ko ez bo hatîm (mesele-a)

Nîşanên pêşiyê yên têkçûna vê sîstemê di wan devokên navendî de yên ko zayend tê de parastî ye têt dîtin.⁴⁷ Di van devokan de, formên nêr *-î* û mê *-ê* hatine guhartin. Ev formên nû eynî morfemên tewangê ne. Ne dût e ko ew ji wê raweyê hatibin. Di hemî devokên kurdî yên mayî de şeweyekê sade û giştî, ko *-î* ye, ji bo îzafeyê heye.

Dîsa em du formên îzafeyê ko ne li gorî zayendê lê li gorî wezîfeyên wan ji hev têt cida kirin di goraniyê de - di devoka hewramî de - dibînin. Ev herdu form, ko ez ji yekê re dibêjim îzafeya rengdêrî *-î* û ji ya dî re îzafeya genetîv *-û*, ji bo herdu zayendan têt bi kar anîn; b.n.

⁴⁴ *Les dialectes d'Awraman et de Pâwâ, textes recueillis par ... B. revus et publiés...par arthur Christensen*, Copenhagen, 1921.

⁴⁵ Devokên vê grûpê li ciyê herî bakur-rojavayî yê devera kurdiyê niho têt, û heta berî midetekê jî dihatin, bi kar anîn, lê ew gelek nêzikî goraniyê ne; bn. berhemê O. Mannî *Mundarten der Zâzâ, ...bearbeitet von Karl Hadank*, Berlin, 1932.

⁴⁶ Di diyagrama rûp. 7-ê de li jorê

⁴⁷ Bi taybetî pişderî û mukrî, bnr. *K(urdish) D(ialect) S(tudies) I*, §§ 179.h, 183.a.

hewramî	<i>kurr-êw-î cwan</i>	"kurekê xort"
	<i>kurr-û min</i>	"kurê min"
	<i>kinaçêwe-y cwane</i>	"keçeka xort"
	<i>kinaçêwe-w xanî</i>	"keçeka Xanî"

Bi baweriya min, kurtbûna îzafeya kurdiya navendî û ya jêrî bo *-î-yê* mimkin e ji ber tevlihevbûna herdu sîsteman be. Helbet, mirov dikare hizra tesîra farisiyê jî bike, lê divêt tesîreka wesa li ser zimanê nivîskî ne yê devkî be. Hîç tesîreka wê li ser peyvsaziya kurdiyê nahêt dîtin.

Îzafe ne rêya bi tenê ye ji bo girêdana navdêran bi wesifkarên wan ve. Hemî devokên goranî, li gel kurdiya navendî û ya jêrî, xwedî terkîbekê ne ko ez navê "hevdudaniya vekirî" lê dikim. Ev terkîb hîngê têt bi kar anîn gava frasa navdêrî binavkirî be û nîşana wê jî vokaleka pevgerîdanê ye; b.n.

hewramî	<i>kurr-e cwan-eke</i>	"kurê xort"
	<i>a kurr-e cwan-e</i>	"ew kurê xort"
	<i>kinaçe cwan-ekê</i>	"keça xort (<i>kinaçê</i>)"
	<i>î kinaçe cwanê</i>	"ev keça xort"

Hember bike

kurdiya navendî	<i>kurr-e cwane-eke</i>	"kurê ciwan"
	<i>ew kurr-e cwan-e</i>	"ew kurê ciwan"
	<i>kiç-e cwan-eke</i>	"keça ciwan"
	<i>em kiç-e cwan-e</i>	"ev keça ciwan"

Hîç şopên vê "hevdudaniya vekirî" di kurdiya jorî de nînin.

Kurdiya navendî di warê paşpirtikên cînavî yên kesîn de ji goraniyê cida ye, lê ne bi qasî cidabûna wê ji kurdiya jorî. Ev paşpirtik heman rola giring di hevoksaziya goranî û kurdiya navendî de dilîzin. Cidahiya serekî di navbera herduyan de formên wan in. Goraniyê ji bo kesê sêyê eynî formên farisiyê, *-ş, -şa(n)*, hene, lê kurdiyê *-î* û *-yan* hene. Ji bo kesên dî, form di herdu grûpan de wekhev in; anku, kesê yekê *-m, -ma(n)*, kesê duyê *-t, ta(n)*. Di devokên kurdiya navendî yên xweparêz de, formên eslî yên kurdî yên paşpirtikên kesê yekê û kesê duyê yên pirhejmar, *-in* û *-û* (hb. avestayî *-no, -wo*), hatine parastin.⁴⁸ Ev rewş divêt li gel rewşa kurdiya jorî, ko tê de paşpirtikên cînavî yên ji vî rengî wenda bûne, bihêt hember kirin. Kurdiya jorî û zazakî di vê guhorînê de şîrîk in. Forma kesê sêyê *-î* (hb. avestayî *-hê*) di belociyê de jî xuya dibe û mirov dikare ji şopên ko di daçekên xweser yên kurdiya jorî û ya navendî de mane⁴⁹ texmîn bike ko ev form berê di hemî devokên kurdî de hebûn. Mirov dikare bigehe vê encamê ko parastina paşpirtikên cînavî di kurdiya navendî de ji ber tesîra dîrek ya goraniyê ye. Hêza goraniyê di asîmîlebûn û guhorîna formên kurdî de jî diyar dibe.

Berî niho behsa forma pasîva neserekî ya lêkerên kurdiya navendî û jêrî hat kirin. Ew di kurdiya jêrî de, wek qaîde, bi alîkariya morfemên *-yê* ji bo dema

⁴⁸ Bnr. *KDS I*, § 197.a

⁴⁹ hs., §§ 237, 302.

niho û *-ya* ji bo dema borî pêk têt. Ev awayê "pasîva *y-*"-yê di goranî û zazakiyê de jî heye û dibe ko forma kurdiya jêrî dîrek ji goraniyê hatibe deyn kirin. Lê ev qet ji bo kurdiya navendî nahêt gotin çunkî herçend ew awa bi karê xwe wek wê ye lê bi forma xwe ji wê cida ye. Morfemên pasîviyê di kurdiya navendî de *-rê* ji bo dema niho û *-ra* ji bo dema borî ne. Tifaq li ser vê yekê heye ko ew li ber formên kevnar yên lêkera "kirin"-ê hatine çê kirin; weha,

Têper Pasîv

ke- (< *ker-*) : *kirê-* (< *krye-* + *-ih-*) : : *X-* : *X-rê-*

ku *X-* qurmê lêkerekê têper ya dema niho ye. Heger îdiaya ko forma pasîva neserekî ya han di kurdiya berê de nebû qebûlbar be, peydabûna wê di kurdiya navendî de dikare ji goraniyê be.

Nimûneyeka dî ya biçûk ji tesîra goraniyê di lêkguhartina pêşpirtika lêkerî ya kurdiya jorî, *ve-yê* (bn. farisî *bez, ve*) bi "paşpirtika lêkerî" *-ewe-yê* di kurdiya navendî de têt dîtin. b.n.

kurdiya jorî *ve kir* : kurdiya navendî *kird-ewe, goranî kerd-ewe*

ve girt : *girt-ewe*

ve şart : *şard-ewe şara-we*

Goraniyê ne bi tenê eynî paşpirtika *-ewe-yê* di vî wezîfeyî de heye, lê wê du paşpirtikên "paşlêkerî" yên dî jî hene.

kurdiya jorî *rû nişt* : kurdiya navendî *da nişt* : goranî *nişt-ere*

kurdiya jorî û navendî *da xist* : *wist-ere*

ku di kurdiyê de nînin.

Bona ko terazû biedile, sîmayeka kurdiya jorî heye ko ji devokên kurdî yên dî pirtir nêzî hewramiyê ye. Di devokên dî de, morfema pirhejmariyê ya gelemperî, wek farisiya kevin, *-an* e; lê kurdiya jorî û hewramiyê sîstemeka durawe di pirhejmarî û herweha di yekhejmariyê de parastiye. Vêca, *-a(n)* di kurdiya jorî de bi taybetî morfema tewangê ya pirhejmariyê ye, lê pirhejmara xweser bê pirtik e; b.n.

kurdiya jorî *mişk der keftin*

ez dê va mişka der êxim

Du morfemên pirhejmariyê di hewramiyê de hene: *-ê* xweser û *-a* tewang; b.n.

hewramî *a kitêbê* "ew (gelek) pirtûk"

a kitêba bare "wan pirtûkan bîne"

Diyar e ko guhorîn di van herdu devokan de hemdem lê serbixwe bûye. Devokên dî yên goranî, yên ko O. Mannî qeyd kirine, eynî prosesa giştîkirina morfema pirhejmariyê *-a*, wek kurdiya navendî, derbaz kiriye; b.n.

kendulayî⁵⁰ *dizekan ramay* "diz revîn"

kerekan-iş besyanawe "kerên wî hatin girê dan"

gelwerayî⁵¹ *a tûtane kuşîsin* "ew kûçik kuştî bûn"

⁵⁰ *Mundarten der Gûrân*, 311 û 322

⁵¹ hs., 454

Di hinek devokên kurdiya jêrî û devokên goraniyê de, vê prosesa nûjen ya peydabûna morfemeka giştî ji bo pirhejmariyê pêngavek pêştir avêtiye. Di wan devokan de, morfema "kolektîv" *-gel* yan jî jêderên wê li şûna *-an-ê* têt bi kar anîn.

Bi kurtî, çar diyarde hene, derveyî nûtirîn guhortinan jî, ko diyar e kurdiya navendî û ya jêrî ew ji goraniyê deyn kirine.

- paşpirtika binavkirinê *-eke*
- "hevduvaniya vekirî" li şûna îzafeyê
- forma pasîviya neserekî ya lêkeran
- paşlêkera *-ewe*

Du diyardeyên dî jî ko wan ji kurdiya jorî cida dike vedigerin tesîra goraniyê. Ew jî

- sivikkirina sîstema îzafeyê, û
- parastina paşpirtikên cînavî yên kesîn

Heger em bala xwe bidin belavbûna niho ya kurdiya navendî û jêrî û li gel giravên goraniyê yên mayî hember bikin, ez bawer dikim ko encama mirov nikare jê bireve ew e ko substratumeka (zemîneka) goranî di van devokên kurdî de heye, lê devokên kurdî yên jorî reseniya xwe heta radeyeka mezin parastîye.

Berî niho tekezkirina wê rastiye ko elementên, bi awayekê serekî, îraniya başûr-rojavayî di kurdiyê de hene ji min re zehemet bû. Bervajî wê, sîmayên bakur-rojavayî di goranî û zazakiyê de baş berçav in. Nêrîneka serpê jî li rewşa îro ya herdu grûpan diyar dike ko ew grûp di qonaxên cîguhoriyê yên berbiçav re derbaz bûne. Ne zehmet e ko mirov van encamên zimannasî, heger mirov bikare wan wesa bi nav bike, wegerîne ser termên cografîk û dîrokî. Xweragirtina gelê zaza, yê ko wek têt zanîn di esil de ji Deylemê li ser qeraxê başûr yê Xezerê hatiye, di yekîneyeka biçûk û veder de faktoreka giring e ko mirov bala xwe bideyê. Bêyî delîlên dîrokî yên zêdetir, ne beraqil e ko mirov biryarê bide ka ew ji ber pêlên kurdan ji ciyê wan ber bi rojavayî ve hatine guhastin yan jî wan xwe di nava devereka saxlem ya li bin desthilata kurdan de xistiye. Kêm zêde, ravekirina pêşiyê dikare mimkintir be.

Vêca, texmîneka giştî dê hosa be. Li pêşiyê, piraniya kurdan ber bi bakurî ve bo nav Ermenistanê çûne, û bi ihtimal zaza derxistine. Paşî, goranan Zagrosê başûr û derdorên wî dagîr kirine û li dawiyê, di demên paştir de, pêleka dî ya kurdan ji bakurî hatiye û xwe bi ser goranan de girtiye û hêdî hêdî ew tev, ji bilî yên ko mane, di nav xwe de helandine. Dijwarî di tarîxkirina van bûyerên texmînî de derdikeve. Lê, pêwîst e mirov ji bo çareserkirina vê pirsgerêkê li delîlên ne bi zimanî ve girêdayî bigere.

Wergêr:

Newzad Hirorî
nhirori@hotmail.com
Stockholm, 6/2 2006